



KEMSA wek organizasyon

KEMSA kurtkirina "Kurdish European Medical Student Association" ye. KEMSA organîzasyoneke nedewleti ye û ji alîyê du xwendekarên bijîşkî, Reband Ahmed û Aram Azîzî ve di çirîya paşîna 2012an de, li bajarê Brnoya Komara Çekî hatîye avakirin. Di wê demê de KEMSAyê li ser Internetê bi rîya medyaya sosyal bi hin gruban re têkilî danî. Dûre KEMSAyê bi kêm endaman be jî li çend welatên Ewrûpayê komîte ava kirin. Û di çirîya pêşîna 2013an de, KEMSAyê di nav rêxistina şemsîyeyî "Kurdish European Medical Association (KEMA) cîh girt.

Armancên KEMSAyê

Yek ji armancên KEMSAyê ew e ku xwendevanên bijîşkî yê ku li fakulteyên tibê yê welatên Ewrûpayê dixwinin di nav rêxistinekê de organîze bike. Ya din, di pêşerojê de di pirsên mîna perwerde û stajê de piştgirîya endamên xwe bike. Herwisa KEMSA dixwaze di navbera xwendevanên bijîşkî yê Ewrûpa û Kurdistanê de têkilîyan xurt bike û wan nêzîke hevûdu bike.

Xebatên KEMSAyê

KEMSA mîna netverkekê kar dike û têdikoşe ku xwendekarên bijîşkî yê niha û yê pêşerojê, bi enstitu, komele, akademîsyen, acente û fakulteyên kurd û ewrûpîyan bide nasandin. KEMSA ji bo bigihîje armancên xwe bi gelek awayên cûda dixebite. Di nav wan xebatan de belavkirina enformasyonên girîng li ser perwerdeyê fakulteyên tibê yê Ewrûpayê heye. Karê stajê beşeke girîng ya perwerdeyê tibê ye û KEMSA hewl dide ku ji bo staja endamên xwe îmkanan çêbike. Herwisa KEMSA dixwaze endamên xwe ji rewşa xebatên ku di warê tenduristîyê de li Kurdistanê çêdibin, agahdar bike û balê bixşîne li ser rewşa tendurustî û bijîşkîyê.

Feydeyê endambûna KEMSAyê

Mîna endam tu di warê pêşdebirin û piştgirîwergirtina perwerde û karîyera xwe de ji KEMSAyê gelek alîkarî dibînî. Ya din jî em ê bi hev re ji bo alîkarîya civata xwe bixebitin û piştgirîya sêwî, pênaber, pîr û kal û hemû kesên ku muhtac bikin.

Em hertim bi we re ne!

Komiteya karger ya KEMSAyê